# Kesên xwedî cihên siyasî yên pêşçav

Di 1-ê tebaxa 2015-ê de şertên nû li qanûna pereşûştinê hatin zêde kirin ku divê bank bizane ka kîjan mişteriyên wê xwedî cihên siyasî yên pêşçav in. Ev hem ji bo wan mişterîyan e yên ku li Swêdê dijîn û hem ji bo wan mişterîyan e yên ku li derveyî welatî dijîn.


Foto: Martina Huber/Regeringskansliet


**Kesên xwedî cihên siyasî yên pêşçav - PEP**
Kesê ku di dewleteké yan rêxistineka navneteweyî de xwedî wezîfeyên resmî yên giring in yan giring bûn, xwedî ciheké siyasî yê pêşçav (Politically Exposed Person– PEP) e. Serokê dewletê, endamên parlamentoyê, serokwezîr, endamên civata partîyên siyasî yên ku di parlamentoya Swêdê yan parlamentoya Yekîtîya Ewropayê de nûner in, dadgerên Dadgeha bilind û Dadgeha îdareyê ya bilind, mifetişên îdareya dewletê, birêveberiya Banka dewletê, balyoz, leşkerên pilebilind (general, fermandarê bilind, serleşker, generalê hêzên deryayî, cihgirê wî û fermandarê hêzên deryayî), birêveberê giştî yan endamê meclîsan yên şîrketên hikûmetê yan jî kesê (ku endamê meclîsê, sekreterê giştî û hwd. be) di birêveberiya rêxistineka navneteweyî de ji wezîfeyên resmî yên giring in.

PEP ji ber meqam û bandora xwe dibe xwedî cihek yê ku rîskê peyda dike ku ew tevî hin tiştên din ji bo kirina tawana rişwetê bihê bi kar înan.

**Endamên malbatê û hevkarên naskirî**
Herweha divê bank bizane ka kîjan mişterî endamên malbatê û hevkarên naskirî yên PEP ne. Jin/mêr, yara/ê qeydkirî, hevjîn, zarok û jin/mêrên wan, yarên wan yên qeydkirî yan hevjînên wan û dêûbav endamên malbatê ne.

Hevkarên naskirî ev in:

- kesê ku bi hevparî li gel PEP-ekî xwedîtiya şîrketeké dike yan jî bi awayeké din bandoreka biryarder li ser şîrketeké heye,
- kesê ku bi awayekê din têkiliyeka nêzîk – ne şert e ku têkiliyeka bazarî be – bi PEP-ekî re heye yan hebûye,
- kesê ku bi tena serê xwe xwedîtiya şîrketekê dike yan bandorê li ser wê şîrketê dike ya ku di rastiyê de ji bo berjewendiya PEP-ekî hatiye ava kirin.




**Berpirsiyarê rastî**
Heger mişterî şîrketek be, divê bank kontorl bike ka xwediyê rasterast yan yê nerasterast PEP-ek e, ka xwedîtî di şîrketê de ji 25 % zêdetir e yan ka ew kes di şîrketê de xwedî bandoreka biryarder e.

**Divê bank pirsiyaran bike**
Qanûna pereşûştinê şertên giran ferz dike ku bankê zanînên baş li ser mişteriyên xwe û karûbarên wan yên bi bankê ve eleqedar hebin. Divê bank armanca rewşa karûbarên bi bankê ve eleqedar û pereguhastinên cuda yên mişteriyî fehm bike.

Divê bank hin tedbîran yên ku ji tedbîrên adetî zêdetir in – tedbîrên dijwar – bi kar bîne gava mişterî PEP-ek be. Ev tevî hin tiştên din tê wê maneyê ku divê bank erêkirina biryardereké eleqedar yê bankê bistîne berî ku têkiliyeka ticarî li gel PEP-ekî bê dest pê kirin. Herweha, divê bank hin tedbîran bi kar bîne da ku çavkaniya sermaye û malê mişteriyî ya ku bi têkiliya ticarî û pereguhastinan ve eleqedar e tesbît bike. Heman tişt ji bo endamên malbata PEP-ekî û hevkarên wî yên naskirî derbaz dibe.

Lewra, bank dê gelek pirsiyaran ji PEPekî, endamên malbata wî û hevkarên wî yên naskirî bike. Bona wê, demeké dirêjtir pê diçe heta ku bank têkiliyên ticarî yên bi rêya bankê li gel kesên weha dest pê bike û li ser bixebite.

Hemû agahdarî yên ku bank werdigire bi nihênî û di çarçoveya nihênîkirina karûbarên bankê de li ser tê xebitîn

**Lipeyçûna berdewam**
Divê bankê nûtirîn agahdariyên mişteriyên xwe hebin. Ji ber ku rewşên kardariyê û pêkhatinên malbatê û hwd. ji demeké bo demeka din dikarin bên guherîn, pêdvî ye bank berdewam agahdariya ku wê di van waran de ji mişteriyî standine nû bike.

**Gava kesek êdî ne PEP e**
Gava PEP-ek wezîfeyên xwe radiwestîne, bank 18 mehan paştir jî wî wek PEP dihesibîne. Piştre, bank hilsengandina rîskan dike.

Svenska Bankföreningen
Swedish Bankers' Association

www.swedishbankers.se
Telefon: 08 – 453 44 00